**Di Navbera Bîranîn û Bîr‘ne’anînê de Pirtûka Mehmûd Yeşîl *Desteyek Ji Çîroka Jiyana Min***

**Bîranînên nivîskî wek çavkaniyek bêhempa bo dîroknûsiyê**

Di nav salên dawî de aktorên siyasî yên kurd ku bîranînên xwe dinivîsînin û didin çapkirin zêde dibe. Ger em bînin bîra xwe ku berhemên bi vî awayî yek ji çavkaniyên sereke yên dîroknûsiya li ser rewşa aborî, siyasî û çandî ya civakekê ye, bîranîn çiqas zêde bên nivîsandin roniya li ser dîroka civakekê jî wê ewqas zêde bibe. Em dizanin di destpêka sedsala bîstemîn de ku hemû cîhan di nav guherîneke radikal re derbas dibû, gelek aktorên kurd jî di nav vê guherînê de cî digirtin. Ji wê serdemê îro gelek nav tên bîra me wek lehengên serhildanan, endamên rêxistin û partiyên siyasî, dîplomat, nivîskarên di kovar û rojnameyan de hwd. Lê gelek kêm berhemên bîranînî tên bîra me. *Doza Kurdistan*a Zinar Silopî (Kadrî Cemîl Paşa) û *Ağrı Dağı İsyanı* [Serhildana Çiyayê Agiriyê] ya Ihsan Nûrî Paşa û *Rojên Almanyayê* ya Celadet Ali Bedirxan çend mînak in. Her yek ji wan bo dem û mekana xwe çavkaniyên bêhempa ne; bêyî wan dîroka dem û mekanên wan nayên nivîsandin.

Yek ji wan bîranînan ku ji îro ve bo dîroknûsiya kurd çavkaniyek girîng e, pirtûka Mehmûd Yeşîl *Desteyek Ji Çîroka Jiyana Min* e (weşanên Doz, 2009, Stenbol). Di paşerojê de dema şahidên dewra 40-50 sal berê êdî nemînin, wek gelek berhemên din, qedrê vê berhemê jî ew ê baştir bê zanîn. Mehmûd Yeşîl di sala 1938a de li gundê Garisiya bi ser Silîvayê ku ji ber peywira bavê wî ya melatiyê li wê derê bûne, hatiye dinyayê. Lê malbata wî bixwe ji gundê Baxça ya bi ser Silîva ve ye û li wir mezin bûye. Di Gulana 2016an de çû ser dilovaniya Xwedê. Digel ku ev pirtûk ji çend aliyên din ve dikare bê nirxandin lê di vê nivîsê de ez ê li dû van sê pirsan biçim: Gelo bîranînên Mehmûd Yeşîl bo çi an li gor çi çavkaniyek girîng e? Mirov dikare di kîjan çarçoveyê de wan binirxîne? Gelo piştî xwendinê kîjan pirsan li dû xwe dihêle?

**Bi xwendineke dij-dîroknûsiya fermî**

Bi rastî li pişt nivîsandina piraniya bîranîn an otobiyografiyan hewldana sazkirina paşerojeke baştir heye li bin siya azmûn û dersên dema xwe. Wekî din, ji bo bîreke civakî ya xurt çêbibe hewldana neqilkirina azmûnên dewra nivîskar bixwe heye. Bîranîn gelek caran awayek tevkarî, îtiraz an midaxelekirina dîroknûsiyê ye an hewleke rêlibergirtina jibîrbûyina dewra xwe ye. Lewma bîranîn bi qasî ku amrazên dîroknûsiyê ne, ew dikare bibin amrazên darûxandina (deconstruction) dîrokên fermî jî. Bo me kurdan kêmtirîn du dîrokên fermî hene: yek a dewlet/ên serdest, yek jî ya rêxistin an tevgerên siyasî yên serdest in di nav kurdan de. Bîranînên Yeşîl dikare him bo darûxandina dîroka fermî ya dewleta tirk him dîroka fermî ya tevgera PKK ku bo kurdên li bakûr çêkiriye bê xwendin.

Mehmûd Yeşîl ji ew kesan e ku ji salên 1950yan ve pê re fikrên kurdayetiyê çêbûye û di nav tevgera hişyarbûna netewî ya kurdan a piştî Duyem Şerê Cîhanê de bi awayekî çalak cî girtiye. Ji agirê Newrozê bigre heta mitingên petrolê û azadiya kurdan, ew û kadroya salên 1960 û 1970yan bûne pêşengên gelek çalakiyên bo vejandina hestên netewî. Tevî Mele Evdilkerîm

Ceyhan û Şêx Mihemed Şakir bi awayekî *de facto* di 1960î de KDP, wek rêxistina siyasî ya ewil li bakur damezrandine; di salên 1970yî de bûye aligirê damezrandina DDKOyê. Hemû çalakî û bûyerên wê demê ne mijara vê nivîsê ye. Lê digel ewqas xebat û çalakiyên girîng û seferberkirina gel, nifşên piştî salên 1980-90î mezin bûne piranî dîroka tevgera kurd bi PKK didin destpêkirin an wisa dizanin. Ji ber ku PKK dîrokê bakur bixwe dide destpêkirin. Kesên wek Mehmûd Yeşîl, Muhterem Biçimli, Mehmûd Okutucu, Şêx Mihemed Şêrîn, Rojen Barnas, Mehdî Bûdak hwd. di nav nifşê nû de nayên naskirin; tune hatine hesabkirin û lewra ji azmûnên vî nifşî jî nehatiye îstifadekirin, hatiye xwestin bên jibîrkirin. Lewma di pêşgotinê de Yeşîl diyar dike ku "hîmên tevgera kurdî ya îroyîn di salên şêstî de hatiye avêtin" (r.12). Ev hevok bi serê xwe îtirazek e li hemberî dîroka fermî ya siyaseta PKK û zanîna nifşê niha. Wekî din ew welatperweriya xwe digihêne Tevgera Şêx Seîd, Agirî, Dêrsîm, Xoybûn, Binxetê û Mela Mistefa Barzanî û taybetî bi nivîsandina bîranên xwe dixwaze vê berdewamiya dîrokî dupat bike berovajî tunehesibandina tevgera serdest. Ev dikare wek hişyariyekê bo dîroknûsên paşerojê bê xwendin.

### Bi xwendineke xwemalî

Mehmûd Yeşîl bixwe û bîranînên wî daneyên biqîmet dihewînin li dijî vatişa çep û kemalîstan ku têra xwe niziliye nav hişmendiya siyasî ya kurda. Li gor vê vatişê şêx û mela an bi giştî hêmanên dînî û hêmanên civakî yên nerîtî paşverûtiyê temsîl dikin û li ber netewîbûn an dewletbûna kurdan her tim bûne asteng. Bi taybetî piştî ku siyaseta kurd ket bin bandora aktorên siyasî yên ku ji dibistanên fermî yên dewletê derçûne û medreseyên kurdî her çû îtibar û bandora xwe ya di nav xwendayên kurd de winda kir, ev vatiş xurt bû. Êdî dîroka serdemên pêştir dema ku hemû civak dîndar bû û şertên awayekî din ê jiyanê tunebû jî, ji peywenda xwe hat derxistin û bi riwangeyeke pozîtîvîst hat xwendin/nirxandin/nivîsandin. Em heta Şêx Ubeydullah, Mela Selîm, Şêx Seîd, Şêx Riza hwd. dûr neçin, Mehmûd Yeşil û ew kadroya siyasî ku li Silîva çalak bûne piraniyek wan mezin dîndar bûn, medrese xwendibûn an pir kêm marûzî dibistanên fermî û saziyên modern mabûn. Lê dîndariyê nasnameya wan a siyasî diyar nekiriye, rê li ber welatparêzî û netewperweriya wan negirtiye. Yeşîl bixwe ji malbateke şêxa ye, medrese xwendiye, çend salan meletî kiriye û dû re dev ji meletiyê berdaye, dest bi bazirganiyê kiriye. Di hemû van qonaxan de nasnameya kurdayetê jî pê re bûye.

Di temama pirtûkê de em dibin şahid ku ew di navbera dîndarî (an nasnameya umetî) an nasnameya netewî de dudilî nebûye, ew herdu jî bi hev re bi rihetî meşandine. Heta şêxbûna malbata wî, xwendina wî ya medreseyê û melatiya wî kiriye ku çalakiyên welatparêziyê hêsantir bimeşîne. Jixwe berhemên Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Siyapûş, Ehmedê Xanî ji malbata xwe û medreseyê hîn bûye. Ligel van di jiyana xwe ya rojane de jî dikare têra xwe rasyonel tevbigere, wek mînak ne li dijî faîzê ye. Heta ew jî ber bayê çepitî û sosyalîzmê dikeve lê ev ji dîndarî an neteweyîbûna wî re nabe rikber. Dîndarên derveyî siyaseta kurd dema wî bi jidînderketinê tawanbar dikin ew bi rihetî ji heq wan tê der. Dema meletî dike şaşika xwe li gundê lê meletî dike dide serê xwe lê derveyî gund kes wî bi şaşikê nabîne, di jiyana civakî de nafikire nifuza şaşikê bi kar bîne. Yanê, bi giştî ji pirtûkê diyar dibe ku awayekî din î dîndariyê hebûye ewçax û belkî tovên sekulerîzmeke xwemalî jî di xwe de dihewand an ihtimala werareke

xurtir a dîndariyê ber neteweyîbûnê zêde ne dûr bûye. Em niha li bakur dibînin siyaseta derçûyên zanîngeh û dibistanên dewletê û îdeoloyên sekuler jî kurd bêtir nêzî rizgariya netewî nekiriye. Belkî wext hatiye em bi nêrîneke bêtir giştgirane (inclusive) li pêşiyên xwe binêrin û riwangeya dîroknûsiyê biguherînin; di navbera nifşên îro û wan de pirekê ava bikin. Yeşîl behsa civîneke çapameniyê ya sala 1991ê dike ku li wir bêsebeb çend xort slogan davêjin û dibin sedema mudaxeleya polîsan. Yeşîl xortekî hinda xwe hişyar dike ku wisa neke, ew xort vê dibêje: "Jixwe hûn paşverû ne, hûn nahêlin meriv tiştekî bike". Belkî li vir Yeşîl bal dikişand ser tunebûna vê pirê.

Lê mirov ji vê jî haydar be ku tovên gelek nîqaşên derbarê hişmendiya siyasî ya kurd jî di wê dewrê de hatine avêtin. Em partiyên nêz-dewlet ên wek AP, DP deynin aliyekî, dema hê siyaseta kurd partiyên xwe ava nekiribûn siyaseta sosyalîst a TİPê û bayê xurt ê sosoyalîzmê di nav kurdan de bûbû sedema dijberiyên girîng. Hevoka Nîyazî Ustayê navdar mînakek e bo vê: "Ez ji bo kurdîtiyê rojekê ranazêm lê ji bo komunîzmê 16 salan radizêm" (r.174).

**Perwerdeya medreseyê**

Yeşîl bi hûrgilî behsa gihandin û perwerdeya feqiyan dike ku kaniya vê sîstemî gundî bixwe bûn. Wan feqî xwedî dikirin, pêdiviyên xwarin û paqijiyê wan dabîn dikirin. Mele bixwe jî ji dewletê mûçe nedistendin û ne girêdayî dewletê bûn. Lewma bi qewlê şêx "mele û feqî gelek caran ... tiştên dewletê ew qedexe kiribûn dikirin. Wan xwe bi dewletê girêdayî nedidît. Rizqê wan ne ji dewletê lê ji milet dihat. Wan jî menfaetên gelê xwe di ber çavan re derbas dikirin ... ji dewletê azad difikirîn..." Mirov nikare tiştên çûye şûnde vegerîne û jixwe pêdiviyên îro jî cuda ne  lê bi vê helkeftê em dikarin careke din li ser encamên perwerdeya dewletê/fermî bifikirin. Heta em gavek wêdetir biçin û li ser kaniya rewşenbîrî an siyasetek organîk ku bêyî pêşeroja xwe red bike an bêqîmet bike ji çeşitdariya cîhanê sûd wergire, xwe dewlemend bike.

**Li Hewlêrê dîlên Filistînî û darûxandina vatişa çep**

Yeşîl bi awayekî rojnamegereke alman û dosta kurda Lissy Schmidt nas dike. Schmidt jî wek her çepgirên ewropî di piştevaneke dawa filistiyan e. Yeşîl jî ji ber ku filistinî li hemberî kurdan alikariya Sedam Husên dikin, li hember wan ne ewqas erênî ye. Ev cudatiya navbera wan de carekê xuya dike lê nikare bi awayekî eşkere vê ji Schimdt re bêje, ew ê nikaribe bi wê bide famkirin. Schmidt li Hewlêrê bixwe rastî kampeke filistîniyên tê ku bo şerê kurda hatine Kurdistanê û dîl hatine girtin. Schmidt pir ecêbmayî dimîne û vê carê fam nake hê jî çima nehatine kuştin! Ev anekdot bixwe dibe puxteya nîqaşên derbarê dawa filistiniyan e ku di nav kurdan de hê îro jî dewam dike.

**'Ne'bîranîn**

Gelek caran di nivîsandina bîranînan de qasî ku tiştên tê bîra mirov ewqas tişt jî tên 'jibîrkirin' an bi gotineke din tên oto-sansurkirin. Yeşîl di pêşgotinê de gotiye yên di pirtûkê de cî negirtine wê demeke din binivîsîne lê em nizanin ew çi ne. Lewma em li gor ên nivîsandî biçin ne zehmet e ku mirov bêje Yeşîl qet nexwestiye qala tevgera PKK ku ew ji destpêkê ve bûye şahidê wê, bike. Tenê bi hevokekê jî qal nekiriye. Gelo mumkun e tiştekî ku Yeşîl li ser PKK bêje tunebe? Qe bîranînek wê hêjayî neqilkirinê tunebû? Mumkun e gelo li hember

tevgereke ku wî şahidiya peydabûna wê kiriye erênî an neyênî helwestek wî tunebe? Gelo sedema vê oto-sansurê çi bû? Di bîranînan de qasî tiştên hatiye gotin ên nehatine gotin jî girîng in û hêja ne mirov li ser wan bifikire. Sedem her çi be kêmasiyek mezin e ku em wek xwîner û nifşên dû wî re nabînin ka mirovekî wek Mehmûd Yeşil derbarê tevgereke nêzî sî sal e di nav kurdan de serdest e, çi difikirî, helwesta wî çi bû. Bawer im xwediyê bîranînan çiqas kêm xwe sansur bikin ewqas zêde wê bikaribin dîrokên fermî hilweşînin; bo nifşên paşerojê dîroka siyasî ronîtir bikin.

